



ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha çand û Ragihandina Encûmena nîştîmanî kurdî

Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje

Sernivîs-Yusra Zibêr

Lêvegera Ziman- Mihemed Kose

Ji bo têkiliyên We bi Me re

Li ser Amêlê

Rojname.enks@gmail.com

Jmar 7

مكتب الثقافة والإعلام

Pêşgotin

Çarenûsa Şagirt û Xwendekarên kurd

Heger em bi hûrayî binerin li Civakên pêşketî û xwedan Geşepêdana Abûrî û Civakî emê bibînin ku pir Faktor bihevre ew Civak û Pêşketin encamdan lê hemî pişkdarin bi Faktora Ezmûneke perwerdê û Fêrbûnê ya serkeftî çunkî Ewe Binaxa ya ku ew Civakên pêşketî li ser hatine avakirin. Û li vêde Pirsê ku dive bê kirin ewe : li kû di mênê Ezmûna Perwerdê û Fêrbûnê li Kurdistana Sûriyê û gelo Metirsî liser Çarenûsa Şagirt û Xwendekarên heye yan ew paristîne ji çi Hişdarîkê li ser Paşeroja wan. Rijêmên li peyhev li Sûriyê Xwepênezaniyê û Xemsarî di Warê Kerta Xwendin û Perwerdê li Deverên kurdî di şopandin û Nefşên kurd yê nûhtatî armancdikirin yê ku di Sipêde wê bibin Stûnê avakirna Civaka kurdî ,lê heyhat ku ew Pêlana neyartî bi Cihbê di Rexê Miletê mede û Malpata kurd Giran û Arzan danî da ku Şagirtên kurd Xwendina xwe sekeftî berdewam bikin bi ser ku Miletê kurd di Doxek Zehmet de dijî bi Awekî Giştî. Lê aneha dibin Siha ya binav Rêveberiya xweser Astê Perwerdê û Fêrbûnê gihiştîye Awekî ku tu Carî Rijêmê di Xewde ne didît lê mexabin bûye Rastîyeke Mergezat dilsezên Metirsîya wê li ser Mande û Hatûwa tevahiya Cicaka heye vêce çawa û çima Kiryara Perwerdê têkçû. Ji despêka Şoreşê ve nêzîka nivê Hijmara Millete kurd ji Warê xwe terqîya ye bihtirê wan ji Zarokan bûn lê Şensê wan baştirbû ji ên ku li hindrû man ji rexê Platformên Xwendinê çinku zû tevî Rêbazên xwendinê bûn yê wan Wlatan piştî ku fêrî Zimanê wan bû. Berê û nihajî Fêrbûn bi Ziman kurdî ji Miletê mere Xwenbûn lê mexabin Rêka Çewt û (heye yan bimebest)ya ku pê hat derbaskirîni hîşt Xewndekarê kurd bihtir bixezan di Dibistanên Rijêmê de bixwênin lê piştî Biryarên dawî yê deselata PYD û Bace û Sizayên mezin hiştîye xwendin pir zehmet çebûye di Dibistanên Rijêmê û Dibistanên birayên Kirstian . Hemî Hêzên Ramîarî Siyasî û Rêxistinên Civaka Sivîl divên Fişarekê li ser deselate bi wekalet bi çespênin heye ku Huşyariyê ji Wijdan re bi wan re çêbibe da ku nefşên kurd bêne qurtalkirîni beriya ku dem bibihûre bi van Gavên tîn : 1_ dive Desteyên Profîşînal xwedan Behwernamêyên bilind Platformên Dibistanan amade û berhev bikin,da ku Cihê rêz û Mukirkirîni dinav navendên navdewletî bin . 2_ dûrkirna Îdyolciya PYD(PKK) ji nav Platforman çunkî Prosêsa Perwerdê dive bê Layen be û dûrbe ji Rêbazên Parteyatî . 3_ Mezxandina Zimanê kurdî bi rengekî hesan û rêk û pêk di nav Platforman ta Prosêsa Armancên xwe bicih bîne. Bi Riya van Hersê Gavan Çarenûsa Şagirt û Xwendekarên li Kurdistana Sûriyê windanabe çunkî ne Azadiya rastî û ne Geşepêdana Abûrî û Civakî wê hebe , heger Nefşên me yê nuh bimênin nezan wek ku Rijêmên xwedan kîn jê re pêlan kirine .



Helwesta Encûmenê

Mihemed Isma'îl

Di 22/10/ 2018 an de civata tevayî ya Encûmena Niştîmanî kurd li sûriyê li bajarê Qamişlo. Li darket destpêkê di warê siyasî de helwesta Enks hat diyarkirin li ser rêkeftina Idlibê, kêşeya Efrînê û kiryarên Pvd Civînê tekez kir ku rêkeftina Idlibê di nav bera Rûsan û tirkên de siheka aramiyê anî li ser deverê û metirsîya koçberiya bi hezaran kes ji wê deverê ku hinek jiwan divê hatibana devera Efrînê wê zêdetir tengavî li ser miletê me da anîba Ji bilî kuştin û wêrankirinê ,lê belê hîn metirsî heye ku Iran tevlihevî li wir bike, û nehêle rêkeftin bi dûmîne Her weha civat li ser rewşa Efrînê û wan delîvên ber teng û mercên dijwar ku têde derbas dibe Ji bal melîsên nejadperest ,piştî kiryarên xirab yê Pvd bi serê wan anîbû di vê derbarêde Encûmen bi hemî şîyanên xwe li pişt miletê Efrînê raweste û di hemî dîdar û karên diblumasî kêşeya Efrînê yê serekebe çî ji aliyên Navdewletî û çî ji alî Opozisîona Sûrî be . Di derbarê hewildanên guhertina dimografî,dest li ser kirina li ser mal, milk û samanên miletê me Herwisa li ser kiryarên Pvd li ser Encûmenê û girtina Ofîsên wê û bin çavkirina serkerde, endam û layangirên wê kû xizmetek erzane , ji nehzên kurdan re .Zêdetir çandina dijayiyê di navbera kurdan û pêkhatên deverê , bi girtina Qutebxanên xirstyana û kuştina hinek serbazên rêjîmê ku xelkên Tertûs û latqîyê nefret li kurdan kirin û ziyaneke bê hempa gihande xebata kurdî Ji aliyê Opozisîona sûrî hat tekez kirin berdewamiya xebatê di nav rêzên Opozisîonê de û di nav desteya dan û standinê û komîta Destûrê . Enûmen wê bi mîne hilgirê piroje yê netewî kurdî ta pêkanîna mafên rewayî yê gelê kurd li sûriyêke Fîdralî , berlemanî dîmoqratî ,fere hizbî ,bê cawazî bo hemî miletê Sûrî.



Serhan İsa

Kurd û Şoreşa Sûrî Xeleka (4)

Mebest ji xelekên buhurî

Di van xelekên derbasbûyî de me hewil da, kurtexwendineke bilez di pêvajoka „Şûreşên Buhara Erebî „ û Şûreşa Sûrî de bi taybet bikin. Ev xwendin, xwendineke takekesane bû, anku dibe em şaş çûbin, an jî kêmkurtî tê de hebin, lê her dimîne nerînek takekesane. Lê tiştê herî giring jî bo min ew e ku gelek Analîze dîtin û nerîn di vê derbarê de hatine nivîsandin û gotin lê di gumana min de 95% jî wan nerîn û analîzeyan ne serbixwe û azad bûn, belê girêdayî berjewendiyên takekesane, Olî, Netewî, Nijadperestî û whd bûn. Bi rastî min


hewil da ku di dema nivîsandina vê nerîna xwe ya takekesane de ez xwe dîr bikim an jî xwe bişom jî hemî girêdanên Takekesane, Olî, Netewî, Hizrî, Siyasî û whd. Îcar hetanî kîjan radeyê ez di vê yekê de bi serketime ez ê vê nirxandinê dihêlim jî xwendevanan re. Serhildana 12 Adarê 2004 deqeke Kurdî ya reş e li ser eniya pêkhatên Sûrî Hetanî vê gavê Piraniya Erebên Şofînîhizir û Rewşenbîr, Siyasetmedar û rêxistinên Siyasî û Sivîl yên Sûrî dibêjin Serhildana 12 Adarê ne Şûreş bû û ne serhildan bû?! Bêguman bi wê bihaneya ku xwedêgiravî, 12 Adarê bûyereka lêdan û bihevçûnê bû di navbera cemawerê Tîma gokê ya Al Cîhad (Qamişlo) û Tîma gokê ya Al Fitiwa ya Dêrazirê de. Kurtkurmancî û bê nîqaş hemî pêkhatên Sûrî di 12 Adarê de xinizî kirin, û riwê xwe reş kirin, dema Kurd bi tenê di nav lepê Rêcîma Esed ya Diktator de hiştin. Ev kurtkurmanciya ku em qala wê dikin, nayê wê wateyê ku em jî nîqaşê direvin, belê ev kurtirîn bersiv e li ser xinizî û hizirşofîniya Ereba ye, bi tayîbet dema ew bê şerm û tirs dixwazin pênasînan li ser kêfa xwe bidin , „Têgeha Şûreşê“ anku bi wateyêke din hun dibêjin 12 Adarê ne Şûreş bû?! Baş e dêmek bûyera neynûkrakirina zarokên Deraa jî ne Şûreş bû Xweşewitandina „Muhamed Al Bûezîzî“ yê Tûnisî jî ne Şûreş bû? Mixabin ne tenê pêkhatên Sûrî belê piraniya partiyên Kurdî Sûrî jî ev Şûreş jî naveroka wê derxistin û vemirandin û hetanî vê gavê di edebiyatên xwe yên hizbî de nav lê nakin Şûreş?! Dibêjin Bûyer, an jî xwepêşindan, an jî nerazîbûnên cemawerî. Ji bo dîrokê û jî bo ku nifşên dahatû tifi serûçavên we bikin, bala xwe bidin qurbaniyên miletê Kurd di Şûreşa 12 ê Adarê de, a ku çirawîska wê jî Qamişlo dest pê kir û revêna wê gihîşte hetanî Heleb, Laziqiyê û Şam ê. Li gor agahdariyên ragihandina navdewletî û a rêxistinên mafên mirovan ٣٠ kes Şehîd ketin û bêtir jî 160 kesî birîndar bûn û bêtir jî 300 kesî, jî aliyê Rêcîmê ve hatin binçavkirin. Li gor الهيئة السورية العليا للطلبة الكورد على فيسبوك komîteya Sûrî a bilind ya xwendevanên Kurd li ser Facebook ê navên pakrewanên Şûreşa 12 ê Adarê 2004an ev in:

Nav û paşnav	Rojbûn	Roja Şehîdbûnê	Ciyê jidayîkbûnê
Ciwan Xorşîd Hesên	26/3/1987	26/3/2004 Fîşek	Qamişlo
Mihemed Ebdulrezaq İbrahîm	1987	12.03.2004 Fîşek	Qamişlo
Ferhad Mihemed Elî Sebrî Dawid	4/4/1975	6/4/2004 işkence	Qamişlo
Ahmed Xelîl Mihemed	1980	12.03.2004 Fîşek	Qamişlo
Edrîs Remedan Mirad	1982	12.03.2004 Fîşek	Qamişlo
Mihemed Zair(Mihemed ziyad İbrahîm Yûsiv)	1978	13.03.2004 Fîşek	Tilmehrûf/Qamişlo
Gîvara Bedran Xelef	1985	12.03.02004 Fîşek	Qamişlo
Mihemd Emîn Yûsev Mihemed	1979	12.03.02004 Fîşek	Qamişlo



Sîwan Enwer Koyî	14.04.1986	26.03.2004 Fîşek	Qamişlo
Hisên Xelîl Hesên	1984	08.08.2004 Fîşek	Amûdê
Nûrî Mehmûd Paşa	1985	15.03.2004 Fîşek	Serê kaniyê
Ehmed Miho Ginco	25.03.1967	03.08.2004 îşkence	Serê kaniyê
Ferîda Ehmed Reşîd (diya şehîdan)	1961	16.03.2004 Fîşek	Afrîn
Celal Kemal Ibrahim	01.01.1989	16.03.2004 Fîşek	Afrîn
Gîvara Hesên	1985	16.03.2004 Fîşek	Afrîn
Hisên Nehso Bin Hemo	1988	20.03.2004 îşkence	Afrîn
Diya Al Dîn Nûrî Nesir Al Dîn		13.05.2004	Mehşoq/Tirbespî
Ehmed Merhê Mihemed	1981	13.03.2004 Fîşek	Abrê/Dêrik
Xelîl Osman Hisên	1953	17.03.2004 îşkence	Qamişlo
Xêrî Berces Cîndo	1983	20.03.2004 îşkence	Qezlaçox/Amûdê
Bedîh Celo Delef	1983	11.08.2004 Fîşek	Qezlaçox/Amûdê
Hisên Nûrî Ehmed	18.03.1988	14.03.2004 Fîşek	Dêrik
Welîd Bedrî Şahîn	1987	13.03.2004	Dêrik
Xesan Ebdulqadir Qencar	05.09.1981	13.03.2004 Fîşek	Hisiçe
Imad Yûsev Elî	03.03.1985	13.03.2004 Fîşek	Hisiçe
Arî Fewzî Welo	1989	16.03.2004 Fîşek	Heleb
Qasim Mihemed Hamid	1983	2004 kuştin	Dêrik
Henan Bekir Henan Dîko	53 Salî	28.09.2004 îşkence	Qeredoxan/Efrîn
Hemade Ebdûlhenan Hemade	1972	24.06.2004 îşkence	Qitmê/Efrîn
Ibraîm Mihemd Sebrî	1980	16.03.2004 Fîşek	Eşrefiyê/Heleb

Ya rastî ew e ku milletê Kurd li Kurdistana Sûrî ji tevaya cîhanê re da diyar kirin ku ew xwedî vîn û hêzeke xurt e û di her dem û dewranê de amade ye ji bo mafê xwe ya rewa Erşê Desthilatdarên xwînmij bihejîne û Şûreşa 12 ê Adarê berztirîn mînak e. Ji layekî ve, ji ber ku em li ser qûnaxeke dîrokî di dîroka Sûrî de bi giştî û a kurdî de bi tayîbetî diaxivin, û ji layê din ve dema di hundirê welatekî de „Hevparên“ te Dîrok, maf, têkoşîn û şeref û namûsa te û tevlîbûna te bi Şûreş re, dixin pêr û mêzênê û dinirxînin, wê çaxê tu mecbûr dibê ku tu Şûrê rastiyê di nav çavên wan de lêxîne û rastiyên dîrokî deyne ber destên wan, ji ber vê yekê pir giring û pêwîst bû ku em bi kurtasî behsa Şûreşa 12 Adarê bikin. Derencama vê kurtenerîna me li ser Şûreşa 12 ê Adarê dixwazim bînim ziman ku Sê sedemên bingeîn hebûn ku bûn fakterên têkçûna Şûreşa 12 ê Adarê: Tevgera Siyasî ya Kurdî li Sûrî nikarîbû helwesteke mêrane bide, û serkêşiya Şûreşê bike, û ma dîla Rêcîmê. Kurd man bi tenha xwe, sîng bi sîng li himber Rêcîma Diktator û xwînrêj, piştî ku tevayê pêkhatên Sûrî piştî xwe dan wan. Cîhanê bi giştî û bi tayîbet Emerîka û Ewropa û Cîhana Erebbî man bê deng, û ne di berjewendiya wan de bû, di wê qûnaxê de tevlîheviyê li Sûrî çêkin an jî Rêcîma hilweşînin



Dr. Mûnîb Ehmed



Şoreşa Eylûlê berdewame

Di 14 Temûza 1958 an de li Iraqê bi serperştiya Ebdil Kerîm qasim (şoreş)li dijî sîstema Malîkî rabû ku tê de Ofiserên (azad) bejdarbûn ji bo avakirina Komareke Iraqî bo hemû gelê Iraqê bi Arebên xwe ve û kurdan û pêkhatayên din. nemir Mustefa Berzanî ji rêberên pêşîn bû ku pirozbahiya Ebdilkerim Qasim kir û yekser ji Soviyêta berê vegeza Bexdayê û ji aliye cemawerkî zor mezin hat pêşwazikirin û di roja diwan de Berzanî ji Aliyê Ebdilkarim Qasim ve hat pêşwazikirin ev guhertin bû cîhê kêf xweşiya bo tavaiya gelê Iraqê bi dewleta xweyî nû ya ûmêda her Iraqîyek ber bi jiyaneke bi rûmet û aram. lê ev kêf dom nekir ji ber peydebûna aloziya ji aliyan hinek Ofiseran wekû Ebdilselam Arif xwedan hizra Şofînî ku ji Medresa Şofînî ya Cemal Ebdilnasir vexwariye disa wekû caran dest bi qirkirina gelê kurd bi rengekî hovane hat kirin kû bû egera Şoreşa rizgarîxwaz ya Eylûlê bi serokatiya Berzanî ye Nemir 1961 -1975, piştî hewldanên Nemir Mustefa Berzanî bi Ebdilkarim Qasim re li bê encam bûn Ebdilkarim Qasim rîya Şofînî ye bijart û dest bi sitemkariya gelê kurd kir û binçavkirina aligerên Partiya Demuqratî Kurdistanî û ragirtina Rojname xebat û girtina Ofîsa Partî li Bexdayê, herweha karîbû xirabiye bixê nav Mala Kurdî de û hinek hozên Kurdî bi çek kirin (Cehşik) û gelek karên xirab di hemû astan de bi gelê kurd kirin. di 11 eylûla 1961ê de Şoreşê dest pê kir bi tekoşîna gelê kurd û zendên Pêşmergeyên qehreman û hizra Serokê netwa kurd Serok Berzanî ew hesta netewî ya rizgarîxwaz bo gelê Kurdistan ku berdewamiya vê hestê heta îro ber bi çave serketina rapirsîna 25 eylûla 2017an de ku dekumintekê girînge ji Kurdistana başûre re herweha di heman mehê de ku di 30 eeylûla 2018an de helbijartinên Perlemana Kurdistanê wê bi rêve biçin ku tê pêşbinîkirin Partîya Demuqratî Kurdistan piraniya dangan bi dest bîne ev ye ji ku ta partî bi hêz bê wê gelê kurd bi hêz be û wê planê dijminê Kurd û Kûrdistanê pûçbîn û wê xweş piştgir be bo Kurdistaniya li herçar parçên Kurdistanê.



Di welat de kes nema , Miletê Me bar dike, Bazdide.

Hişyar Emerê Lalê

Di hemî pêşketin û serkeftinên ku îro roj di cîhanê çêdibin pêşketinên hiş û ramanê azadin ji ber ku azadî pêşketine ,guhertine û serkeftine çêdikê Ta em bibin xudan dewlet jî lê ger em di hiş û ramanên xwe de ne azad û rizgarkirbin emê herdem êşa koletiyê bikşînin û emê nekarbin şaştiya ji nav xwe rakin emê bimînin êsîrê eydiyolociyên sereborî ,weke tiştê îro di welatê mede çêdibê. Ma nakokî heta kenkî ?? emê kengî aqilkî ji xwere bigrin ... emê heta kengî parçebin û lawazbin ...em ketine kula xwe nakokiyên me hiştiye doza me ya bingehînî ji bîrbibêdoza me biye kî wê bikevê di filan komîtê de û kiyê herê filan kongirî Kî wê seroktiya vî wefdî bikê partîti .û kîû kî....di welat de kes nema milletê me bardikê ...bazdidê ..zarokê xwe direvîne...şepirze dibin.. penaberdibin..çavnimzdibin hê em ketine kîrrê hevdo ...welatê me tê firotin di bazargehên cîhanêde...û em hê hevdu qebûl nakin em birayê hevdone em dibêjin emê bibin şîrîkê hevdo .????? .ev verêza he nika vê qûnaxê bi rêve bibê dem dema yekîtiyaye ne dema nakokiyaye dijminê kurda ne li hevin lê li ser kurda hemî yekin û bê nakokîne lê li hember vê yekê mixabin em kurd hê di van nakokiyade dijîn Ci mirov yan jê civak heta rizgarbibê ji rewîşt û tîtalên berê divê wêrebê û zîrebê di hiş û ramanên xwede ,divê bikarê şoreşek guhertinê di mejiyê xwe û civaka xwe de li dar bixê ta em bibin kesek , civakek , welatek pêşketî.....



Ev rewş ber bi Asta navnetewî zelal dibe

Emer Isma'îl

Sûriya û biryarên hêzên navnetewî

Li ber çava ye rewşa Sûriya roj bi roj zêde ber bi qonaxek nexweş ve di çî wêrankirina gund û bajaran û kuştina gelê Sûrîyê li ser destê milîsên Rijêma xûn mij û hêzên bi ser wê ve ji encamên şoreşa wê, li her deverî rewş tev li hev bû, bi teybet li deverên Kurdistanî mîna Efrînê û Kûbayê û gelek cihan li Cezîrê bitaybet ev rewşa şerê dawî li Qamişlo û guhertina dêmografiyê çêdibe , dema em li ser giringiya wê rawestin bê çî çareserî jimera pêwîste û em jî nîzîke dibînin ji hawîrdora me dewletên derdor, ku naxwazin tu lev hatin li nav Sûriya û Kurdan pêk were, lewma bi her şeweyî li dijî tevgera me kardike û pilana pêktînin û destê xwe dirêjî nav welat û millet dikin, ji hêla din ve dewletên navnetewî û bi teybet dewleta Emerîka û Rûsiya bandorek nebaş dileyizin tenê dixwazin me kar bînin weke hêzên çekdar di xizmeta armancên xweda ta şer li welatê me drej bo giha vê qonaxê Ji encamên vê yekê hêzên tarî yên xwediyê tirorê xwe pir bi hêz kirin û dewleta bi navê ya Islamî li Îraqê û Şamê bi nav kirin û bûne bela serê gelê Kurd, ku dijminê gelê Kurd wan li dijî Kurdan li Başûrê Kurdistana û Sûrîyê bi kar tînin, êrîş bi êrîş li dijî Kurdan bi kar tînin. Ev rewş ber bi Asta navnetewî zelal dibe, di deverên me de berevanî berferêh û bi hêz dibe, alîkariya navnetewî bi xurtî bi hêzên Kurdî li Başûrê Kurdistanê dibin. Hevpeymanî navnetewî bi belafirên xwe piştewaniya hêzên me dikin, lewma diyar e ku ev berevaniya li dijî hêza Terora reş ji berjewendiyên dewletên navnetewî ne, êsta bihtir xurt dibe. di van rojên dawî de giftûgo li ser çare ser kirina siyasî li Sûriyê û Rojhilata Navîn tê gengeşe kirin û Emrîka jin nûve li Rijêma Esed dixwze Îran ji welatê wê der keve tê xuyakirin ku qonaxeke nû despê dike lê mixabin Têvgera Kurd jî weke ku merov dibîne ne li ser heve, yekrêziya rêzanî ne li ber dest e, lewma pêwîstiya me pê heye, ku merov karibe rê li ber nakokiyan bigire. Em dikarin bêjim ku Dem dîsa hatiye ku PYD dev ji kiryarên xwe yên xirab berdin û xew ji bin xizmeta Rijêma Sûriya bikêşîne û li peyman Hewlêrê 1 û 2 û peymanî Dihokê u hemî destê xwe bidin hev li ser bingeheke rast û destê alîkariyê ku ber bi me dirêje bigirin û bo berjewendiyên xwe bi kar bînin, hêviya serkevtinê xurt dike ku azadiyê û rezgariyê bi dest bixin. ji ber qonaxa siyasî wê bê kurdan tu çareserî çênabe li Sûriyê û hêzên navnetewî wê pestger bin bû mafê gelê Kurd hindurê çareserîya rewşa Sûriya bigiştî.

Raporta Taybet

Li ser mafê netewe û gelan bi aştî û ewlehiyê

Bi bûneya ya Roja Cîhanê de

Têgihîştina aştîyê bi pêvajoya demê û rêbazên wergirtina wê çêkiriye pêşxistin. dîtina aştîyê hişmendiyên her demên drav dirêj kirine .Di şer de dijberiya aştî ye. Ev meriv ji azadiya wî bê veşartî û rûmeta wî mirovî vedixwe. Ji ber ku amûrên navnetewî ji ber vê yekê hişyar bûn ku ji ber xetera şerr û hişyariyê banga wan bikin. Ew li ser armancên Neteweyên Yekbûyî di parastina aştîya navneteweyî û ewlehiyê de, sazkirina têkiliyên dostal ên di navbera neteweyî û serkeftina hevkarîya Dewletên Yekbûyî yên ku ji hêla rêbazên aştî yên aştî ve çareser bikin çareser bikin. Cîhan her sal pîroz dike. Di 21ê Îlonê de roja cîhanî ya aştîyê, di çarçoveya beryara de ji hêla komeleya Giştî (36/67) di 1981 de hate ragihandin, dê bibe buneya cîhanî ta ku tevahiya gelên cîhanê bi hev re pêk rabin. Di roja 1982'an de civîna komela Giştî ya Parlamenterê 55/8282 di 21ê Îlonê de her pêşniyara yekem roja Aştîyê hate kirin. Aştîya Cîhan, agirbestek, parastina tundûtûjî û kuştinê di nav neteweyî û pêşveçûnê ya îdeal û nîrxên ji bo pêşveçûn û belavkirina aştîyê di nav netewe Peymana Şerê Neteweyên Yekbûyî, Ji bo çareserkirina çareserkirina aştîyane pêşniyar dikin ku di warê cîhanê de ewlehî û aştîyê belav ev tev mijara roja Navneteweyî ya sala 2018 e: Aştîyê - Ji 70-salan ve qebûlkirina Danezana Gerdûnî ya Mirovan a 70 sal e, ev mijara wateya ku Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan, pîroz dike ku ji belgeya xwe nîşan dide Dîroka mafên mirovan Rêxistinên mafên mirovan û destyên mirovane saziyên sivîl yên sûrî vê belgeyê hilberînin, "Dîroka Mafên Gel û Neteweyên Yekbûyî di roja Aştîyê ya Cîhanê" ye, li Roja Neteweyên Yekbûyî beşdar dibin. Ji bo peymanê Neteweyên Yekgirtî ji armanca xwe re şert bikin Ev bêranîn salvegerê bêhnekê dide ko navnetewîya yekbûyî bi cî bîne ew armanca ko ji bo wê Rêxistin û prensîbên ku ew hate saz kirin,. Ev Danezan diyar kir ku pêşxistina aştîyê girîng bû ku ji bo mafên tevayî ên mirovan. Hevbendiya Jinê ya Sûrî, ku ji bo Biryarneya Ewlekariya 1325 ve çalak bike

Amede: hevbendiya jinên sûriya

Nejadê Kurdên li Çiyayê Kurd (Latqiyê û Idlib)

^



Kurd Niştecihkiribûn li çiyayê (Efrin - Çiyayê Kurda Latqiyê) Ji ber ku demên kevnar gelekî paş ve çû serdema Dewleta Mitani, ku li dora sînoren Deryaya sipî û Deryaya reş Dora sedsala pazda berî zayinê dorpê kir. Yê ku lihevhatinên miletan ên Feraîna û bîlad alşam di Levant de derxistin. Û di dema serdestiya "Mîdiya" di şeş sedsala 6'an de berî zayinê împarator û hikûmetên din Kurdî û Farişî, ko ta niha kevnatorê wan li cîne bandorên ku hin çavkaniyên dîrokî yên din, di nav lêkolînerê Rojêh Lesko de , bi pirtûkek "Rêzdar Mardîdian", di dema dema serdema Îslamî Salah-eldîn al-Ayyûbî de, ku bi dehê hezaran Kurd kirin warê leşkeriyê û li herêmên nêzîkî selîbiya li hemberî herêmên wê li dijî herêmên dorpêç bikin, bi hev re bicih kirin. M). Di sala 1230 de, Klas di bin serokatiya mîr (Mend) de hat saz kirin. Ev eşîra kurdî ji Jumah û Kalis ji Sunn û Êzîdiyan tevlihev bûn. 370 salan berdewam kir û dûvre hata xwar û di bin dest hilat dariya mîr (Elî bek canbpolat) de li ser destê Sultan Selim di sala 1607 de di şerê (top boxan) de .Di vê deverê de piraniya du heremên (Selma û Kesba) pêk tê, ku piştî çend gundan tene darizandin, ku li parêzgeha Latiqiya peyda dikan, lê di nav hin gundan de li ser rêgebê lebê - Idlib - Latiqiyê Ev gundên nêzîkî 60 gund hene, ji aliyê 150,000 kesan ve dimînin. Nifûsa kurd çar kulturên kurd hene, di dema çiyayê Salah-eldîn el eyyûbî de, li binavê wîlayeta Wan li parêzgeha Wan ye. Ev clans in: 1. Muşan, ku navê Moş ya Dewleta Wan tê û navê eşîra Wanê di çiyayê herî mezin de ye û li Selma û Dûerîn û mayîn û din jî dijîn. Malbata herî girîng a: Al-Haji, Şemdîn, Hemdo, Fato, Jilalo, Şakir, Primo, Sinmo û yên din. 2 - Eşîra Awjan duyemîn herî mezin e û li Nissba û Nahba ye û erdê elweta û cîn din bicîbûn. Malbatên herî girîng e: Zehuri, Bazîdou, Mûsa, Xelil, Tabnca, Khalilu û yên din. 3.- Eşîra elkîxa (Kaxweda) û gundên Mecdel Kixîya Tauma, birome, Dwêrika û yên din. Malbata herî xwiyanî girîng e: Haj Bekrî, Alî Axa, Bakdaş, fenzoua, colaq, biro û hinin din. 4. eşîra Sheikan piçûktirîn eşîra kevntir e û deryaya şêxan, cisterns, iodoss û din rûniştin. Û malbata herî girîng: Şêxanî û Oso û din. Pirsgirêkên Çiyayê Kurd: 1. Bajar Korş (keleha Nabi Hori) dîsa vegeriya serweriya Mîtanî-Hîtîteyê û yek ji navdarên ku ji gelê Kurd dîr ve ye. 2. Tel Indîwer.



Luqman silêman



Şemdîn û Hemdîn xeleka (5)

yê delo dîn bi sê mitroya li pêşiya wî dikeve û mitrekî di erdê de di çikilê. Hisên axa yê delo dîn lê di zîvirê jê re dibêje: te xêre birayê min te elame berxê bavê mino hey lo? Ehmed axa badikiyê keko min ji tere di got em boza xwedî nekin çirtin oxir dînin ev mîrata dema ku di kevin welatê xerîb û xurbetê tim û dayî dilikumin yan wê stûyê siwarê xwe bişkîn in yan wê deriyê siwarê xwe li mîratê bigerînin berxê bavê mino min ji tere digot: Em va Hemdaniya xwedî nakin çirtin oxir sizin wê rojekî yek ji me derbekî li yê dî bixê wê çira bavê min ji diniya yê bi tefîn in biratî destê biratiyê gelekî şêrîne.. nakevê serê Hisên axa ku wê birayê wî xiyanetê lê bike ji ber ku ew pir ji birayê xwe hesdikê ji wî weye ku birayê wî jî wisa jê hesdikê ji lewma jê bawer kir ku hespê wî likumiye û rim ji destê wî pekiye. Hisên axa cardî li pêşiya Ehmed axa dikşîne lê xenzîrê Ehmed axa vê carê çaçanê Romanî di hejîne û di nava guhê Hemdaniyê re tavê birayê xwe Hisên axa rimekî tavê jê li qulinca çepê dixê di depa singê re davê jê mirênî ji Hisên axa bavê Hemdîno tê mirênî ji gewdê wî xweşmêrî ji ser pêşta Hemdaniyê weka çiyakî têxwarê.. xwîna sor şêrîte xwîne di ser pişta bozêde dirjîne. Dema ku termê Hisên ji ser pişta Hemdaniyê tê xwar Ehmed axa çû di ser termê birayê xwe re sekinî zanî ku mir ji wir bi şûnde di veger piştî qunaxa di roja ji termê birayê xwe dûrket di aliyê başûrê di zîvirê berê xwe didê malê nêzîkayî li malê dikê dî wa şîn boza birayê wî tê kêleka şîn bozê bi xwîne qêrîn bi êlê di kevê Mencê Xatûnê dirabê ber bi bozêde di bezê siwarê wê nabîne bi lez li malê vedigerê Hemdî raza ye Mencê Xatûnê sê denga badikê dibê jê de dera be dera be berxê bavê mino dera be lololo. De lawo mino dilê min dilekî delo dîne mîrata bavê te hatiye û kêlek bi xwîne ez dêna xwe di dimê ez nizanim ne dîsa min mejiyê kera xwariya yan dîsa ez dewixîme ez nasnakim derba li Hemdaniya bavê te ketî ji paş ve ye dikim û nakin çavê min na fitîrîne qesem bi navê xwedê ez nizanim qesasê bevê te kî ye ez dernaxînim derba bavê te ji paş ve lê ketiye berxê bavê min o dera be. Ê hêhê axa yê mino xelkê deverê teva bihîst ku Hisên axa yê delo dîne hatiye kuştin axa û maqul tev hatin ser dana wî rê û rêwanî li binê konê wî nîne. Axa û Mîreka ji Ehmed Begê axa yê delo dîn pirsîn çawe Hisên Begê hate kuştin..?



Erebê Şemo

*weke bavê Romana kurdî tê
bina vkirin. Yekemîn Romana
kurdî ya ku bizimanê kurdî
hatiye weşandin*



Erebê Şemo yan jî Erebe Şamîlov (bi rûsî: Араб Шамоевич Шамилов, *lat. Arab Şamoeviç Şamîlov*; z. 23 kewçêr 1897 li Qersê – m. 21 gulan 1978 li Êrîvanê) nivîskarekî kurd bû û weke bavê romana kurdî tê binavkirin. Yekemîn romana kurdî ya ku bi kurdî hatiye weşandin, Şivanê Kurmanca nivîsiye. Erebe Şemo ji malbatek şêxên êzîdiya bû. Şemo di 23'ê kewçêra 1897'an de li gundê Susuzê li navçeya Qersê, ku di wê heyamê de di bin desthilatiya Rûsyayê de bû, hatiye dinyayê. Erebe Şemo xwendina xwe ya pêşî diqedîne. Di sala 1913'an de, dema ku 16 salî bû derbasî ser karê paletiyê dibe. Erebe Şemo ji bilî zimanê kurdî, welê jî bi rûsî, tirkiya osmanî, yewnanî, ermenî, gurecî, almanî û azerî zanibû. Bi biryara hikûmeta Sovyeta berê û Ermenîstanê Erebe Şemo û Isahak Marogûlov dest bi amadekirina alfabeta kurdî ya bi tîpên latînî kir û di sala 1928'an de karê xwe bi dawî anî. Wan di sala 1929'a yekemîn pirtûka bi kurdiya latînî li cihanê bi sernavê “XO-xO hinbuna xandina nvisara kurmançî” (“Xwe bi Xwe Hînbûna Kurmançî”) çap kir. Erebe Şemo herwiha yek ji damezrênerên rojnameya Rya teze bû. Di sala 1931'ê de Erebe Şemo li Leningradê rastî Qanatê Kurdo tê û hevaltîyeke baş di navbera wan de çêdibe. Ji wir dest bi xebata literaturî û zanistî dibe. Li wê derê nivîsên di der barê pirsgerêkên zimanê kurdî de amade dibe û li Ermenîstanê çap dibe. Erebe Şamîlov, di navbera salên 1937 - 1954'an de tam 17 salan li Sibirya'yê girtî jiyaye. Li vir bi jina xwe ya duyemîn Marîya Vasîlevna ve dibe nas ya ku di van biraninan de navê we derbas dibe, ew bi xwe Ûris bûye. Keçên wi Asê û Zînê ji ve jina duyemîn in. Jina wî ya berê Alman bûye.^[1] Piştî mirina Stalîn ew azad dibe û careke din vedigere Ermenîstanê. Sala 1966'an ew romana xwe ya dîrokî Dimdim belav dibe. Di sala 1967'an de jî ew li Moskovayê berhevoka Hikayetên Gelê Kurd û romana xwe ya bi navê Riya Bextewar diweşîne dibe. Demeke dirêj di komîteya navendî ya Partiya Komunîsta Ermenîstanê de cih girt. Li navenda Êrîvanê li ser dîwarê makke ku Erebe Şemo salên xwe yê dawiyê li wê derê derbas kiribû, wiha hatiye nivîsandin: “di vê malê de ji sala 1963-1978 temenê xwe derbas kiriye rewşenbîrê Kurd û karkerê muxulqeyî Erebe Şemo Şamîlov”



Emer isma'îl



Serxwebûn

Miletê min îro cejne
Yan hebin yan tunebin
Mil bimil bin sef bi sefbin
Herne dengê xwe bidin

Deng bidin ji bona hebonê
Cavê rojê maç bikin
Maf u armanc serxwebûne
Tevda yek pêşmerge bin

Ev welate bendeware
kurdino serbest bijîn
Bese bîndestî bimînin
Li pişta berzanê xwebin

Ev hezar sale rijêmin
Her kelaxê me dixwin
Havilê xaka me mêtin
Kavilan wêran dikin

Dayîka me rot taZî
Ma penaber bendewar
Aleya rengîn dîyarkin
Dayîkên we şabebin

Bikne şahî milletê min
îro roja serxwebûn
Biyek dil u can serfirazî
Hun li ser qada xwe bin

Çend şelatî li rojhilTê
Kongira ew çê di kin
Bes liber lîngan pelaxin
Ji welat wê derkevin

Ger ne xwazî sexwebûnê
Hon ji buna kê dijîn
Bese kîn u zikreşî
Hero divê em hilweşin

Dem bihorî leşkerê hovan
Li ser singa me çon
Vane pêşmergeên dilêr
Dayiş li ber wan difirin

Vaye paytextên cîhanê
Tev sipasiya me dikin
Me tiror şikand
Zarokê jînê ji nû ve raketin

Dil tejî omîd û hevî
Serfirazbin kurdino
Pakrewanê me sirûda
Niştimanî saz dikin

Hilkişin jor gol û çiçeka
Diyarî gel bikin
Kaniyên ava zelal zenga
Nezanîne bişon

Bes bibin xar û nemaşbin
Destê dijminê xwe da
Bûne lîstuk û pelaxin
Herdu alyan kişkişin

Kurdino destan bi desta
Dem u dewran ya meye
Aşê me xweş va digêre
Nanê azadîyê bixun

Zengilê azadîyê va
Guhê dijmina çirand
Roja kurdîstane îro
Em li peyî duza xwe bin

Bavê kemalim di bêjim
Kurdino roja meye
Dest bi desta biyek dil û can
Herne dengê xwe bidin

Ji destên te dayika min
Bi birajtina nanê li ser sêla
te tîrêjên royê hildihat
Bihna genimê şamî ta
Zeviyên duzelikê dihat
Şivan dil geşdibûn ken li
rûyên wan diha
Li dora te kom dibûn
xizmên me bê xilat
Roj derbas dibû bi
henek û xebat
Daaaaaayika min
Ji dûrahiya te dimirim
lê sîng ne tirbe ye
Goçeyên xerîbiyê be
evîne ken lê tune ye
Dayika min çav bi hêstir in
te ha jê tune ye
D[rî hembêza te cihire
Xêr tê tune ye
Hêdî ...hêdî ...dişewitim
Kesî weke te tune ye
Cîhan mezine lê cihê
Kurda lê tune ye



SÎMAV EFRÎN

‘Bela te kursî
Tu hatî bi berger bi teres
Te xwe kire mişmişa helî
Lo dev genî yo tu çî bê a
!Ew pis pisa te tev ji bo k
Lê îro tu bû dûvpişk doç
Te li kê rast hatî lê dane xişt
Yan te qîrandin an jî te dikuşt
!Koka dar ku pîsbe meywe j'pîsî
Kî jê bixwe wê bi jehrî bikev
Lê ku nemre wê çav li zo derkev
Çî poşmanî be bê wate dikev
!Têr naxwê yê ku bijît b'miqrisî
De tu hilgir xwe dolar û peran
Da tu biçe di binde wek keran
Tu bûye xwîn mijê dost û biran
‘Te nanê xwarî her bi vî dimsî
Ku çî têt gotin:tu her bê arî
Tu dev ber de lo ji wî pîs karî
Dawîya te têt biçî b'dijwarî
!Bese ji te têt ew bihna sasî
Pir di xwe nere tu ne bilindî
Ger tu dirust bî hingê tu rindî
An tu nemrûd bî biçî wek kundî
!Wê rabe berhîm û tu biqelsî
Li pêş te heye rojek pir giran
Pêşe roja te wekî ya guran
Ku bikevî dav pirin qîl diran
!Wê çaxê tê birînê be'ilêsî



Bêçarê kurd

dr. Berzan

Xalid



Qamişlokê

Kal bûm

Spî reng serê min

Zu çû gav

Û emrê min

Belengaz û zehmetî

Kûz kir pişta min

Bi darê zorê

Sorgûn kirin ji warê

Ez bûm winda

Li cem hemya

Dengê min birya

Ji war û wa cîya

Evîna min kuştin

Li Qamişlo ne veşarti

Rih û canê min

Li dû ne meşandin

Kanî ew kaş

Ser xweş û baş

HÊLÊLIKA bi aş

Û bê qeraş

Bi hêvî me ji te baş û baş

Dûr ji te hal nebaş

Bi evînim

Tim li ser te dixwînim

QAMIŞLOKA rengîn im

Bi xeml û bi xwînim

Birîndar im bi qêrînim

HEKIM LÛQMAN bi lez bînin

Serokê Kurda li hev bînin

Ez QAMIŞLOKA

Evînim

Tim li ser ziman

Û di nav dil de dimînim

Berzan Xalid

19-1-2014



Konê Reş

welato!

Xelkê cîhanê sosretmayê man

dema ku naskirin ;

ZEREDEŞT pêxemberkî te bû •

SLAHEDÎNÊ EYÛBÎ mirovekî te bû •

Dicle û Firat dû çemên te ne û

Agirî û Cûdî dû çiyayên te ne •

ji wê hingê ve Welato

tu di derîyekî mezin re

derbasî dîroka

welatên cîhanê bûyî...

Welato !

ziman nayêne dizîn •

kes nikare zimanê welatîyên te bidize •

ku welatîyên te li zimanê xwe


guhdarbin

lê ku di ser guhên xwe re avêtin û

bi zimanê biyanîyan axifîn •

wê hingê Welato ;

Welato !.....12 Konê Reş



Se'îd Elçî

1920-1971

Li gundê Zeynebê ya Bîngolê hatiye dinyayê. Piştî xwendina xwe ya dibistana seretayî, perwerdehiya muhasebeyê stand û dest bi karê muhasebeyê kir. Ligel ku zaza bû, Kurmancî jî gelek baş dizanibû. Mirovekî ji gel bû. Di bin tevgerên wî yê nefbiçûk de, kesayetiyeke rih spî û zana hebû. Di sala 1959an de ji "Doza 49an" hate girtin. Di dema girtina xwe de, baş li ber xwe da. Beşdarî li xebatên avakirina PDK-T yê ku di sala 1965an de ava bû û yek ji rêveberên wê. Faîk Bucak dema ku bû Serokê giştî, elçî sekreteriya giştî ya Partiyê hilda ser milên xwe. Piştî avakirina PDK-T yê, ji bo ku zêdetir nêzîkî gelê xwe bibe û di xebatên Partiyê de berhemdartir be, mala xwe ji Stenbolê bir Diyarbekirê. Piştî kuştina Faîk Bûcak, peywira wî hilda ser milên xwe. Xwediyê kesayetiyeke wisa bû ku ji hêla Kurdan ve dihate hezkirin û hurmetkirin. Di sala 1968an de bi operasyoneke li dijî PDK-T yê de hate girtin. Di danişînên ku li Antalyayê hatin kirin de, parastina siyasî kir. Piştgirî kir ku "Mîtingên Rojhilat" çê bibin. Di çendên van mîtingan de axaftinên bi bandor kirin. Piştî Cuntaya 12ê Adarê, ji bo ku xebatên xwe yê siyasî bidomîne, derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Bi lihevnekirineke bê wate û navxweyî de, ji hêla hevalên xwe ve hate kuştin.....



Qasim Mer'îka

Qedrî Cemîl Paşa

1891-1973

Kurê Fû'ad Cemîl Paşa Zada Begê Diyarbekirî ye û li Diyarbekirê hatiye dinyayê. di tevahiya jiyana xwe de ji bo têkoşîna gelê Kurd Peywirên girîng wergirtiye. Her dem li pêş bû. Di sala 1911ê de kete dibistana bilind a Halkaliyê. Hevnasiya wî bi Xelîl Xeyalî re çêbû û bandoreke mezin jê wergirt. Di sala 1912ê de beşdarî li avakirina "Hêvî" yê kir û peywirên girîng wergirtin. Li Lozana ku ji bo xwendinê lê bû, gelek ked da ku şaxa "Hêvî" yê ya Lozanê vebe. Bi destpêkirina Şerê Cîhanê yê yekemîn re vegehiya Stenbolê. Beşdarî li şer kir. Li gelek eniyan şer kir. Li Ammanê wekî êsîr (dîl) kete destê Îngilîzan. Salek û nîv li Kampa êsîran ya li Îskenderiyeyê ma. Di sala 1925an de ji doza Serhildana Şêx Seîd hate mehkemekirin û ji vê dozê bereat kir. Ligel vê yekê jî, bo Burdurê hate nefîkirin. di sala 1929ê de vegehiya Diyarbekirê. Bi rewşenbîrên Kurd ên li Sûriyê kom bûne re kete nava têkilî û danûstandinan. Di heman salê de derbasî Suriyeyê bû. Di nava rêveberiya navendî ya "Xoybûnê" de cih girt. Ji ber van xebatan di sala 1933yê de ji hemwelatîbûna Tirkiyeyê hate derxistin. Di navbera salên 1934-1939ê de nûneratiya siyasî ya Xoybûnê kir. Piştî ku di sala 1946ê de Komara Kurd a Mehabadê ava bû, serdana Qazî Muhemed bi rêveberên Sovyetê re axivî, ji Tebrîzê vegehiya û çû Diyarbekirê. Demek ji bo ku Xoybûn û PDK-Sûriye bibin yek kete nava hewldanan lê bi ser neket. Li Şamê mir. Gora wî li Goristana Şamê ye. berhemên wî: "Doza Kurdistan, Muhtasar Hyatım".....





çûko çûko

çûko çûko sefarî
min ji ter got sed carî
veger li hêlîna xwe
vaye baran dibarî
îro berf û barane
roja xewa girane
agir bûka çileye
tim li dor wê seyrane
çûko veger hêlînê
guh ned qîr û nalînê
heger rokê bihar hat
derkev ji bin kulînê
derkev nav kulîlikên geş
ji bîrbik wa rojê reş
piştî zor û teliyê
wê diyar be demek xweş
çûkê li nav tehtika
her bicivîn darika
hêlînek nû ava bik
ji perî û qirşikan



dîko

dîko dîko dîkê geş
va derbas bû şeva reş
çima nayê dengê te
rabe ji vê xewa xweş
dîkê terî bilind sor
dakev ji banê jor
çêçik manê bê taştê
ne nan maye ne kulor
dîkê reş û pitpitkî
tu melayê gundekî
gundî tev mane bê nimêj
te qîr nekir dengekî
dîko mêrê mirîşkê
birev ji wê anîşkê
sibe wê te serjêkin
ji bo qedika qedîşkê
dîk xistin ber girarê
berî danê êvarê
zaroka bi hev re got
savar xweş e vê carê
